

Kurnîlîus u Petrus

Zelamek hebî li bajêrê Qeyserîê navê wî Kurnîlîus bî, serukê sed leşkera ji hêza Îtalîa bî. Ew u hemî binemala wî ji Xwidê tirs bîn, gelek çakî digel xelkê pêdivî dikirin u her dem nivêj dikirin. U rojekê nêzîkî demjimêr sê piştî nîvru xewnek dît. U firîştê Xwidê bi aşkirayî dît di hate def u gutê, “Ey Kurnîlîus! Nivêj u xêrê te bu bîrhatinê bilind bîne beramber Xwidê u vê gavê hindek zelama bihinêre bajêrê Yafa u gazî ke Sem’anê navdar bi Petrusî. Ewê akincî li def Sem’anê çerim çêker yê ku mala wî li def derîaê.” Demê firîşte digel diaxift çû, Kurnîlîusî gazî kire dî ji xulamê xû u serbazekê ji Xwidê tirsê herdem digel. U ewî hemî tiştê çêbîn gutine wan u hinartine Yafa.

U di roja paştir da demjimêr nehê rojê, demê her sê zelum nêjîk ji bajêrê Yafa dibîn, Petrus çû ser banî da nivêjê bikit. Îna dil girtî bî u dît esmanê vekirî ye wek amaneke mezin ji perokîa şor bî ye erdê girêdaî ji her çar kujîet wê. U yê tijî bî ji hemî corêt gîanewerêt li ser erdî bî rê ve diçin u balindêt esmana u drinda u ewê li ser zikî diçin. Îna dengê gutê: “Rabe Petrus, vekuje u bixol!” Belê Petrusî bersiv da, “Ne Xudan, min çî cara tiştê pîs u hêram ne xwarî ne.” Îna dengî careka dî gutê, “Ew tiştê Xwidê paqij kirî ne bêje ve esmana. Petrus ji ber ramana wê



© Bible Visuals

yê pîs e.” U ev tiştê sê cara hate dûbarekirin u ew aman vegerîa dîtina dîtî guhiştî u di wî demî da ew zelumê Kurnîlîus hinartî pirsîar li mala Sem’anê çerim çêker dikir u di derî da rawestan. U pirsîar kir, “Erê Sem’anê bernîas bi Petrus li vêrê ye?” U di wî demî da hêş Petrusî di ramana wê dîtine da, hizir dikir. Îna Gîanê Pîruz gutê, “Sê zelum yê li hivîa te. Vêca rabe u herre xwarê li def wan u digel wan herre u xû dudil neke, çunku min ew yê virêkirîn.”

U paşî Petrusî ew zelum gazî kirne mala xû da bibine mêhvanê wî u li roja paştir Petrus digel wan da çû u hindek bira ji Yafa digel da bîn. U li roja paştir gehîştine Qeyserîê u Kurnîlîus li çaverîa wan bî u ewî miruv u hevalê xû yê nêzîk daxaz kirbîn. Demê Petrus bi jur ketî Kurnîlîus xû çemande ber pê wî. Îna Petrusî rakire ve u gutê, “Rabe ez miruvek im wekî te!” Paşî Petrus bi jur keft ew digel diaxivî, îna xelkekê mezin dît u gute wan, “Hîn dizanin ku hêram e li ser Cuhî dan u standinê digel bîanî bikit yan jî li mala wî seredana wî bikit, belê Xwidê ya nîşa min daî ku ez çî cara ne bêjime êkî tu yê pîs î yan jî hêram î. U jî ber wê çendê ez yê bi dilê xû hatîm da daxaza we bi cih bînim, vêca ez dişem bizanim buçî we ez daxaz kirim?” Kurnîlîusî bersiv da, u behsa xewna xû kir. Vêca di cih da min hinarte dîf te ra u te baş kir tu hatî u em hemî nuke diamadeî ne li beramber Xwidê da me guh li wan destura bit ewê Xudanî gutine te.”

Îna Petrusî dest bi axiftinê kir u gut, “Bu min bi diristî ya dîar bî ku Xwidê kesê bî ser kesê naexit. Belê jî hemî milleta dê wî kesî wergirin

ewê jê ditirsit u karê rast bikit. Tu dîzanî ew nama Xwidê bu xelkê Îsraîlê firêkirî mezgînîa aşîê digehînit bi rêka ‘Îsayê Mesîh’ Xudanê hemîa u we ya zanî hemî tiştê li devera Yehudîê çêbîn li despêkê li Celîlê bî piştî jêravkirnê ewa Yuhennaî pê gazî dikir. Xwidê ‘Îsayê Nasirî bi Gîana Pîruz u bi hêzê run kir, u ew jî cihekî diçû cihekî u çakî dikirin u ew hemî sax dikirin ewê Iblîsî êxistîne bin hêza xû, çunku Xwidê digel bî. U em li ser wan hemî kirîarîet, li devera Cuhîa u Urşelîmê pê rabî şahdîn, ku ew bi kuştî bi darekê ve hatbî helawîstin. Eve Xwidê li roja sê rakire ve we lê kir ku dîarbit ne bî hemî xelkî belê bî tinê bu wan şahdê Xwidê berî hîngî jê girtî. Ewê me digel xwarî u vexwarî piştî rabîna wî ji nav mirîa. Wî destur da me em mîzgînê bi wî bidîne xelkê xû u şehdeî didîn, ku ewe yê Xwidê dadwer bu mirîa u saxa nîşan kirî. Hemî pêxember bu wî şehdekî didin u her kesê bawerî bi navê wî bînit dê lêburîna gunneha bi navê wî wergirî.”

U demê Petrusî diaxiftin Kurnîlîus u hemî heval u xulamê wî bawerî ‘Îsayê Mesîh’ kir u pesina Xwidê dikir. Îna Petrusî destur da ku ew bi navê ‘Îsayê Mesîh’ jê av bikin. U paşî Kurnîlîus daxaz ji Petrusî kir ku li def wan çend rojeka bîmînit. Demê hevalê Petrusî yê Cuhî li Urşelîmê guh li vê çendê bî, pesina Xwidê kir u gutin: “Vêca Xwidê peşemânî ya daye Netewa (miruv yê ne Cuhî ne) jî da jîanê wergirin.”

- Karê Hinartîya 10:1-3, 4b-9, 10b-20, 23-29, 33-44a, 11:18b